# سەردەمی نوێ

لەلایەن دەستەی نووسەرانەوە دەر دەچێ

خاوەنی ئیمتیاز
د. جەمشید حیدەری
سەر نووسەر
کەریم حسامی

ساڵی یەکەم — ژمارە ٩ — رەزبەری ١٩٦٥ — ئوکتوبری ١٩٨٦ — نرخی ٦ کرۆنی سوید یە


سی ساڵ لەمەو بەر، دڵی پاك و بەهێز و خاوەن ئیرادەی سەردارێکی کورد لە لێدان کەوت.

دڵی قارەمانێك لە لێدان وەستا، کە بە توانا و دەرەتانێکی کەم و ئیرادەیەکی پۆڵایینەوە، بۆ رزگاری کورد و سەر بەخۆیی کوردستان دەستی دایە چەك و بەرەنگاری گەورەترین دەوڵەتی ئیستعمارگەری ئەو سەردەمە بوو.

ئوکتوبری ئەم ساڵ، سی ساڵ بەسەر کوردستانی بێ شێخ مەحمود تێ دەپەڕێ. بەڵام شوێنەواری تێکۆشانی شێخ هەر دیارە و رێبازی ئەو لە کوردستان دا هەر درێژەی هەیە.

یادی ئەو سەردارە مەزنە ئێستاش پاڵ پێوەنەری ئازادیخوازانی کوردە و کردەوە و ئاکاری جوامێرانەی ئەو هاندەری خەبات و تێکۆشانە.

ئەتەوەکەمان لە کاتێکا یادی سی ساڵەی کۆچی دوایی شێخی نەمر دەکاتەوە، کە نیشتمانەکەی لەم دیو ئەو دیوەوە کەوتۆتە بەر پەلاماری لەشکری دوو رێژیمی شۆڤێنی و کۆنەپەرست و خوێن رێژ کە دەستیان لە ئینگلیزی ئەو دەم ئەستاندوە.

بەڵام داگیرکەران خەیاڵیان خاوە. خەباتی ئەتەوەی کورد بۆ رزگاری و ئەهێشتنی چەوسانەوە و بۆ دیموکراسی و ئازادی درێژەی هەیە. ئەو ئاگرەی شێخ مەحمود دای گیرساند بوو ئێستا مەشخەڵی بەرزترە و ئەك هەر ناوچەی سلیمانی بەڵکوو کوردستانی گرتۆتەوە.

"سەردەمی نوێ" بۆ رێز گرتن لە گیانی پاکی ئەو سەردارە مەزنە زۆربەی لاپەرەکانی ئەم ژمارەیە بۆ یادی شێخ مەحمودی نەمر و باسی شۆڕشەکانی ئەو تەرخان دەکات.

# یادی شێخ مەحمودی مەزن



نووسینی: خاوار

شێخ مەحمود لە ساڵی ١٨٨٠ز دا لە سلێمانی لە دایك بووە و لە بنەماڵەی شێخانی بەرزنجیە، ناوبانگی ئەو بنەماڵەیە لە شێخ مارفی نۆدێ و کاك ئەحمەدی شێخەوە بە کوردستان دا بڵاو بۆوە. لە دوای تێکدانی ئەمارەتی بابان و داگیر کردنی ناو شاری سلیمانی لە لایەن لەشکری عوسمانلیەوە، ئەو بنەماڵەیە بوون بە جێگری دەسەڵاتداری ناوچەکەو جگە لە دەسەڵاتدارێتی ئایینی، وەکوو دەمڕاستێکی سیاسیش بەرەبان سەر بوون بە جێگەی رێزلێ گرتن لە لایەن سولتانەکانی عوسمانلیەوە.

بە کەم بەشداری کردنی ئەو بنەماڵە بە بۆ پشتگیری کردن لە خەرای عوسمانلی ئەوە بوو کە کاك ئەحمەدی شێخ ترێکی لە مرید و دەرویشەکانی بە سەر کردا.

بۆ لاپەڕەی ٢

# سائێك لە بەردەم بەردە قارەمان دا

مەنسووری حەفید

بۆ رێز لێنان لە گیانی پاکی نیشتمان پەروەرێك خەڵکی ساتێك بە بێدەنگی رادەوەستن، کە جێی لە بەرمە ٣٠ ساڵ لەمەو بەر، لە دەمە ئێوارەی رۆژی دەی رەزبەری ١٩٥٦ دا کە تەرمەکەی شێخ مەحمود گەیشتە وە دەربەندی بازیان، لە بەر دەم بەردی قارەماندا بۆ ساتێك تەوبان راگرت. ئەوە دوا رێز لێنانی ئەو سەرکردە بە بوو، بۆ ئەو بەردەی کە یەکەم گوللەی شۆڕشی لە پاڵدا تەقاند و بە برینداریش لە پاڵی دا گیرا.

جگە لە وەش دەتوانین بڵێین کە ئارامگەی سەرباری وێبوە، چونکە سەند حەفتەی ماسی لە وێدا بێ بەر و شوێن چوو، بوو بە بەشێك لە سەربارە وسووەکانی رێگای رزگاری کوردستان، دوایی ئەو ماڵئاوایی وریر کرتنە، رێگای شاری خاموش و بێ دەنگی سلیمانی گیرابە بەر، بەڵێ شار هەر هێندە بێدەنگ بوو تا تەرمەکەی شێخ گەیشتەوە، ئینجا دەنگی هاوار و رابەرین وری بە بێدەنگیدا و بۆ بەردانی شێخ لەنێو گووری جەماوەری دڵ بریندار بە تەرمەکەی شێخەوە گەمارۆی سەرا و بەندیخانەیان دا و رێزیمیش لە وەڵامی داواکەیاندا، بە ئەستێ سەر گوللە باران کردن و ئەو شەوەش لەو رابەرینەدا

بۆ لاپەڕەی ٣

هەواڵنامەی کتێب

# DER YASINA KURDISTAN

Roja 2y sêptimberê sala 1979 , di mêjoya xebata gelê kurd de li kurdistana Iranê , bi rojeka reş tête hejmartin. Gundê (Qarnê) li devera Sindos, li nav kurdan de bi Dêr Yasina kurdistan nav û dengên wî yên hatîne gêran . piştî ku li roja 28 î gilavêjê her wê salê , Îmam Xumeynî dijî miletê kurdê muslman fetwa xezayê day û li ber germî û serhişkî û te'sîra ayînî û berdewambûna kevniperistyê, wî pasdar , cendirme , û leşkerê xwe berda kurdistanê.

Bajarên Pawe, Mrîwan û Seqiz wêrankirin , bi sedan kesên bêçek û bêtawan kuştin, bi hezaran xêzan ji tirsên bombebaran kirinê û kuştinê ketne çol û çiya, aware û mişext û derbeder bûn. Xelxalîyê xûnmêj û kujekbû yê ku ji layê Xomeynîyê cellad ve bûye " hakimêşir'î" jibo kuştina azadîxwazên kurd û di çend rojeka de, li bajarên Sine, Pawe, Merîwan, Seqiz û Mehabad bi dehan kes bêy mehkeme , belge û pirsyar gullebarankirin.

Bergirtina qaremanên xelkê kurdistanê yên dilsotî û pır bi kîn, dujminatya Xomeynîyê dilreş pitir dijwarkir û wî ferman da ku gişt kurdistan bête wêrankirin û bikevîte ber şerê aborî û birsîbûnê.

Vê carê ne bitinê pêşmergên çekdar diketine ber wêrankirina dagirkeran; balefirvanên komarî îslamî , belku gelê kurd bigiştî; pîr,law ,jin , zaro ,çak û xirab hemî pêkve ketine ber hêrîşê û kuştinê .

Roja 2y sêptimberê 1979, destekek Pasdar, Cendirme û Caşên devera Sindos gundê "Qarnê" wêrankir , ketne nav xelkê bêçek û bêberevanî, 46 kes jê şehîdkirin, melayê gundî yê ku"Qur'an" birye berê serê wî jêkirin . Heke Dêr Yasîn sala 1948 li Felistînê ji layê Sehyonya ve hatbîte wêrankirin û xelkê wî bitebayî hatbine kuştin , gundê " Qarnê " jî kete ber hêrîşa " leşkerê islamî yê Xumeynî " û xelkê wî gişt hatin kuştin.

Diyare fetwa " îmamê umetê " ji bo xeza û kuştina kurdan , diviya "leşkerê islamî " bi temamî bicih înaba . Vêca Pasdarê "îslamê " bi birandina xelkê " Qarne " waz neîna belku kuştina bitebayî û gişti ya xelkê kurdistanê ya bo xwe kirye bername û sîyaset û kiryarek rojane û bi dehan Dêr yasîn li kurdistanê dubare kirine .

Kuştina bitebayî û giştî ya zehmetkêşên gundê Îndrqaş , Sokend, Sofyan, Serokanî, Kulîc , Qelatan, Korexane, Saroqmîş, Sewzî û Qerol, Qebakenî, Kerîze, Dîlan çerx, Payîn û îdamkirina komeleyî ya lawên Mehabadê , beşek bûn ji sîyaseta birandina gelê kurd ji layê rijîma komarî îslamî Îranî ve .

Nuhe eve heft sal di ser fetwa xeza Xumeynî dijî gelê kurd ra borîn . Ji wê rojê û heta îro kurdistan ya bûye welatekê dagirkirî , kêm bajar û gundên kurdistanê mayne neketîne ber bomban , wêran nekirîne û nehatîne sotin.

Gelê kurd bi serbor (tecrîbe ) zanîye û bo derketîye, ku hîdî rijîmên diktator û faşist li ser kurdistanê dizalbin, hîdî kurdistan wek welatekê dagirkirî bimîne wê her kovandaryên wek Dêr Yasin û " Qarne " bi serde ên. bi tenê yeketî û xebat di kar gelê kurdê bindest ji van kovandary û malwêranya bi parêze .

XXXXXXXXXX

# JI EDEBE BIYANI

Berî salekê (18y oktoberê ) " Malsla Bîncamîn Maluyz" şa'rê şoreşgêrê reş, endamê serokatya kongirê nîştimanî yê efrîqa jêrî ,ji layê rijîma nifşperista efrîqa jêrî hatibû gullebarankirin.

Helbesta Bîncamîn î ya dûmahyê ya ku têde azayî û zîrekya xelkê efrîqa jêrî jibo bi dûmahî înana jîyê çepelê rijîma nejadperist efrîqa jêrî di dete ber çav .

Em bo rêzgirtina bîrhatina vî şoreşvanî vê helbesta wî ya wergêray belav dikeyn:

" Serferazim be wey ke hem ..
le wey ke wam,
serferazim be wey kirdim..
le wey wamkird.
Gijebay besûk zanîn..
reşebay beçok danan rehêley
xwênmî le şiwêne.
Serferazim, jîn bext ekem..
jînim, jîne tak û tenyakem".

************

Ji bo ku Silêmanî ji bombekirinê xelas bibe,Şêx Mahmûdî bajar berda û xwe da çiyayên Kurdistanê.Şêx Mehmûd bi heza xwe ve û alîkariya henek dostên xwe mîna Mehmûd Xanê Dizlî û Kerîm Begê Fetah begê hemawend û kurên wî,demeke dirêj dijî leşkerê Îngilîzî û Îraqê şer kirin.

Reportên nihênî yên îngilîzan bi dirêjî behsa wan şerên germ dike û şerê herî dijwar,şerê Awbarîkê bû, li paş serhildana şeşî îlona 1930-an li ber deriyê serayê,Şêx Mehmûd ji çiyayê Pîran hate Awbarîk û li wir şerkir. Lê mixabin, hêdî hêdî, hêza şêx Mehmûdî lawaz bû û çekê wan nema û dexi û dan jê hate birîn,ev bûn sedem ku Şêx Mehmûd teslîm bibe û îngilîzan ew ji Kurdisanê dûr xist û li taxa Ezemiye li Bexda hate deste serkirin heta şerê Reşîd Alî Geylanî li sala 1941, hingê Şêx Mehmûd ji Bexda hat û li dundê Sîtek li Şarbajêr cîwar bû. Paşî li gundê Darîkelî bi yekcarî niştecî bû.Li sala 1956-an nexweş keft û hinartine Bexda û li 9/10/1956-an heqya xwe kir û termê wî anîn Silêmaniyê.

Xelkê Silêmaniyê û dewrû berên wê bi mezin û biçûk ve ahtin berahiya termê Şêx Mehmûdî,hingê kurê wî Şêx Letîf di zindanê de bû û xwest besdarî taziya bavê xwe bibe,lê hukmetê rê neda û li encam meşeka mezin dijî hukmetê derket û hukmetê meş gulebaran kir û termê pîrozê Şêx Mehmûdî bi ber guleyekê ket.Bi vî awavî giyanê pak û pîroz ê şaswerekê azad û soreşger bi bêhêvî barkir. Hizar silav li giyanê pak û pîroz ê Şêx MEHMÛDÊ nemir bin.

ji rûpel 1

# ŞEŞ SALIYA DESTHELATA

helata faşîsta eskerî bi ser Tirkiyê de girt.Li gor nivîsîna rojnamevanê tirk Mihemet Elî Bîrant,yekji hoyên serekî yên înqilaba eskerî li Tirkiyê mesela gelê kurd bû û her li piştî înqilabê li 15 herêmên Kurdistanê eskerî hukum girte destê xwe. Leşkerê tirk ji bo bêdengkirina hêzên demokratên kurd,hêrîş anî ser Kurdistanê.Di vê hêrîşê de hêza peya û top û belafiran beşdarî kir.Bi dehan gundên Kurdistanê bi darê zorê ji ser axa wan rakirin û birine heremên dûr yên tirkan.Bi sedan kes hatine kuştin û bi hezaran ketin zîndanan.Li seranserî Tirkiyê partî û rêxistinên siyasî û demokrasî qedexe kirin û hêzên demokrat ketin ber hêrîşan û zîndan pir bûn ji têkoşer û azadîxwazan.

Li gor enformasyona mafên mirovan li 12/9/1980 -roja înqilabê-81634 ketin zîndanan,6353 kes bi îdamê hatin hukumkirin.Ji van 5550 kes ji tekoşerên tevgera çep rizgarîxwaza kurd bûn.Heta niha pêtir ji 440 kesan hukmê îdamê li ser derketiye.

Lê di ser vê hemî hovîtiyê re,faşîzm nikariye xwestin û hêza şoreşger û demokratên tirk û kurd têk bide.Pêkhatina "Yekitiya Çep li Tirkiyê û Kurdistana Tirkiyê"ji şeş partiyên demokrat û şoreşger nîşana hişyariya hêzên pêşverû ye û domkirina tekoşîna wan e.

Di nivîsareka nûnerê "Yekitiya Çep li Tirkiyê û Kurdistana Tirkiyê" weha hatiye:li Tirkiyê hêsankirîn mafên mirovan nayên dîtin,tawan êşkence li dijî xelkê bû ye siyaseta dewletê. Şerekê bêdawî dijî gelê kurd dest pê kiriye.Tirkiya û Kurdistan ev şeş salin di şertên dîktatoriya faşîst de dijîn. Temamî partiyên siyasî yên berî înqilabê kar dikirin hatine qedexe kirin.Komîta aştiyê, mamosteyên pêşverû endamên yekitiyên demokrat bi hukmên giran ketine zîndanan.Sitem û zorî li ser gelê kurd gihaye dereceyek kesneditî. Piştî înqilaba 12-ê Îlonê 1980-î,ewên bi zimanê kurdî diaxifîn û xwe bi kurd didin naskirin bi cinayetkar tên hisabkirin û ceza digirin. Pir ji gundên li ser sinûrî bi darê zorê cûlkirine û xelkê wan veguhastine ciyên dûr.

Yekitiya Çep,ji pêwîstî hatiye damezrandin û nûnerên wan partiya ji bo azadî û demokrasiyê li welatê xwe tekoşînê dikin.Armanca Yekitiya Çep,herifandina rejîma dîktatora-faşîste û sazkirina hukmeteka demokrata-welatperêze.

Bê guman pêkhatina Yekitiya Çep gaveka pîroze ber bi vegerandina demokrasiyê û azadiyê li Tirkiyê.

Em hêvîdarin li Îran û Îraqê jî ji bo serkeftina tekoşînê û herifandina rejîmên dîktator û paşverû- yekitî û hevkariyeka xurt pêkbê û li jêr sîbera tekoşîna şoreşger û yekitiya tekoşînê û siyaseteka rast û bêqirê,gelê tekoşerê kurd jî bigehe mafên xwe yên rewa û azad û serbest bijît.

Navnîşaneme eve :
SERDEMA NÛ Box . 7066
Spanga 7 , 16307 Sweden
Postgiro : 420 4506 - 2

Hindîstanê,hinek bûyer û helwêstên nû anîn meydanê. Elî Şefîqê Ti[illegible](Ö demîr),ew demek bû li devera Rewandizê piropagende dijî Ingilîzan dikir û bi derew soz dida ku kurd, bigêhin mafên xwe,eger Îngilîz ji wîlayeta Mûsil bên derkirin.Rosan ji peywendiyên xwe bi tirkên Kemalîst xurt kiribûn, şerê tirk û girêkanji bi dawî hati bû û tirk bi serketibûn-ku bi rastî kurdan rolekî mezin di vê serkeftinê de hebû-.Lewra îngilîz neçar bûn hinek nerm bibin û Şêx Mehmûd ji Hindîstanê vegerandin û li Bexda Şêx Mehmûdî melikFeysel dît.Di wî demî de bû ku Şaîrê Kurd Şukrî Fezlî ev helbesta pêşkeşî Şêx Mehmûdî kir:

"Îş ke rûy êsta le hewraze serew jêr nekey Fikrî wirdîş ewî,her be du'aw niwêjî nekey Gêre şwênê ke kay konî be bada le kinit çake her lê xurî,seyrî dem û kawêjî nekey".Bi vî awayî Şêx Mehmûd vegerya Silêmaniyê û li 10/10/1922-an hukmetek pêkanî bi serokatiya birayê xwe Şêx Qadirî û hukmeta Berîtanya û Îraqê jî qayil bûn bi mafên rewayên gelê kurd ku dewleteka kurdî pêkbê li wan deverên ku piraniya xelkê kurd in û wefdek şandin ji bo destnîşankirina peywendiyên Kurdistanê û Îraqê. Şêx Mehmûdî dest bi kar û barên dewletê kir û leşkerekê kurd dirust kir bi beşdariya efserên kurd yên ku ji leşkerê Osmanliya revîn, ala kurd bilind kir,perên Kurdistanê çêkirin û belav kirin.Sirûda nistîmanî,rojnama Kurdistan û Rojî Kurdistan derçûn,ku organên hukmetê bûn Li paş têkçûna dewleta cara duwem, çapxane birin şikefta Casene li devera Sordaş û li sala 1923-an,rojnama Bangî Heq,hejmara yekem,li 5-3-1923-an derçû,bitenê sê hejmar, derketin û dirûşmê wê jî ev bû"Naskê be top û bomba,Serfirazê Bangî heq",anko bi top û bomba em naşikên,Bangê Heq serfiraz e.

Behskirina bûyer û biserhatiyên ser dema hukumeta Şêx Mahmûdî behsekê dûr û dirêje,ew sedemên bûne hoyê lawazbûn û nemana wê,behseke pir bi xem û perêşaniye û di nivîsarekamîna vê mirov nikare behs bike.Lewra em dê tenê behsa peywendî û helwêstê biyaniya bikin. Di destpêkê de, em dibêjin nexşe û pîlanên nihênî tiştek e û meselên ber bi çav tiştekê din e.Tiştê ku eniya sûndxwaran belav dikir ku hemî gelên li jêr hukmê Osmanliya dê rizgar bin,tiştekê derew bû,rastiya wê peymana, Saykis-Bîko a nihênî bû ku li 9.3. 1916 li navbera Berîtanya û Feranse hatibû îmzakirin.Di dawiyêde Rosan ev peyman qebûl kiribûn û li gor vê peymanê hemî Kurdistana îro li jêr destê tirkaye wê ji Rosan re ba. Lê Îngilîzan her ji zû çavên xwe biribûna birên petrolê li Kurdistanê ji ber vê yekê wan bi hêsanî Kurdistan ji destên xwe nedikir û lewra ji bo bi cî anîna vê daxwazê destên xwe dirêjî Fransiyan kirin.Li paş şoreşa Oktoberê, Rosan xwe ji vê peymanê kişand-bi rastî her Ros bûn ku ev peymana rîswa kirin-êdî tirsa Îngilîza nema ku sinûrê wan û Rosan bi hevra be Belgên nihênî eşkere dikin ku sedema Îngilîza dixwest dewleta Kurdistan saz bibe,ew bû ku Kurdistan bibe perdeyek li navbera wan û Rosan Kurdistanê bi vê rewşa teze bihayekê mezintir peydakir li cem îngilîza.Fel û xap û cambaziya Ingilîzan her ji zu navdare.Ew karîn bi demeke kurt Ferense qeyil bike ku dev ji wîlayeta Mûsil berdin beramber hinek petrola Iraqê.

Li wî demî yê ku Şêx Mehmûd li Hindîstanê bû,tirk mijûlê astengên xwe yên hundirî bûn.Kurd,Ermenî û Asûrî her yek ji wan bi awayekî hereket, dikir. Hêrîşa Grêkan tirseka mezin xistî bû dilê tirkên Kemalîst. Lê piştî ku Şêx Mehmûd vegeriya Kurdistanê û dewlet damezrandî,îngilîz karîn nizikî kemalîsta bibin û melîk Feyselî piştrast bikin ku tirsa hêrîşa kemalîstan li ser wîlayeta Mûsil nemîne,her weha îngilîz karîn dostaniya tirk û rosan jî tekbide, beramber ku van soz da tirkan ku hukmeta Kurdistana başûr nehêlin ya ku tirk pir jê hers bibûn.

Ev bû ku peyman Sîver ya ku di bendên, 62,63,64-an de behsa mafên gelê kurd dikirin,helweşînin û peymana Lozan ciyê wê girt,ev peymana mafên gelê kurd bi pişt guhên xwe ve havêtin.

Bi vî awayî rîsê kurda bû hirî ji îngilîzan re û berê tekoşîna kurda îngilîzan xwar. Şêx Mehmûdî xebat kir ku dostekî ji gelê kurd re bibîne û ji bo vê mabestê nameyek bi nûnerekê xwe re şande cem qunsilê Ros li Tewrêzê di nameyê de şêx daxwaz ji Lenînî dike ku alîkariya kurdan bike.(Ew name li sala 1923-an li rojnama Piravda hate weşandin).

Îngilîzan li destpêkê hewil dida ku Şêx Mehmûdî weke mirivekê xwe bi kar bîne, lê şêxî tenê hêviya Kurdistaneka azad û serbest di dilî de bû.Di helbestekê de Şêx Mahmûd bi eşkerayi bêzariya xwe beramber îngilîzan nîşan dide:

Namewê jînî esaret,besme omrî gumrehî/Nayke me ser xom be destî muddeî,tacî şehî/Qet be emrî dijminan im,namewê fermandehî.

Li gor wê pîlanê ya ku hatiye kêşan, leşkerê Berîtanya û Îraqê û bi piştgiriya hêza asmaniya îngilîz li sala 1924-an hêrîş kirin ser bajarê Silêmaniyê û bajar bombebaran kirin.(Jewahîr Lal Nehro di bîreweriyên xwe de behsa vê bombebaranê kiriye).

▶

alîakriya Osmanliya.Deng û basên
wan roja wesa dida zanîn ku leşke-
rê Ros dixwaze bajarê Silêmaniyê
dagîr bike, lewra piraniya xelkê
Silêmaniyê karê xwe dikirin ku ji
bajarî derkevin.Şêx Mahmûdî kar di-
kir ku peywendiyên xwe bi leşkerê
Ros re dayne,ji bo ku eger ew çûna
nava bajarê Silêmaniyê ziyane xel-
kê wê nekin,lê di wî demî de şore-
şa Sosyalista Oktoberê li Rosya bi
serkeft û leşkerê Ros vegerya we-
latê xwe î Îngilîzan jî li 7/5/19
18-an bajarê Kerkûkê girtin.Osman-
liya dagîrkirina Kerkûkê ji alî in-
gilîzan kirin sûcê Şêx Mehmûd ûdi-
gotin kû wî alîkarî bi Arnold Wil-
son-berpirsiyarê Ingîliza-re kiri-
ye.Lê dagîrkirina Kerkûkê ji ali-
Ingilizan gelek wext negirt û tir-
kan dîsa li 24/5/1918 Kerkûk stan
din û xistine jêr destê xwe û Şêx
Mehmûd ji Silêmaniyê bi girtî şan-
dine Kerkûkê, li wir dane dadgehê
û biryar dan şêx Mahmûdî li sêdarê
bidin (îdam bikin).Lê Elî Îhsan pa-
şa,serleşkerê Osmanliya dixwast,sûd
(qezenc)ji desthelata şêx Mehmûdbi-
bîne, lewra şêx Mehmûd efû kir,çek
û pere jî danê û şandine Silêmani-
ye ji bo ku wê heremê ji Ingilîzan
biparêze.

Lê mana Tirkan jî li Kerkûkê pir
wext ne girt û li gor rêkeftina Mo-
dirîs ya li 30/10/1918-an hatiyeîm-
zakirin, Kerkûk ji Îngilîzan re ma.
Pêş şerê yekem ê cîhanê û di dema
şerî jî de,Ingilîzan her hêdî-hêdî
efser û şarazayên xwe dişandineKur-
distanê ji bo ku rewşa kurdan ji
nêzîk bizanin û gera Rîç nimûneyek
bû ji van hewildana.

Di dema şerî û di paş şerî jî da,
bitaybetî ew Ingilizên ku ew demek
bû li Hindîstanê bûn û hatibûne des-
nîşankirin ji bo vê mebestê bi ni-
hênî û eşkerayî dihatine Kurdista-
nê. Piştî ku Bexda hatiye dagîrki-
rin. Mîcerson hate devera xaneqîn
û dewrûberên Kifrî û Kaptin Noel-
kû paşî bû Mîcer-hate cem Şêx Meh-
mûdî ku ew demek bû destê xwe danî
bû ser herêma Silêmaniyê. Belgên
nihenî eşkera dikin ku Mîcer Noelî
dixwest ku dewleteka Kurdî pêkbîne
û her di wan belgan de Noêlî pirbi
germî daxwaz ji Berîtanya dikir ku
dewleta Kurdistan pêkbîne.

Mamoste Refîq Hilmî di bîreweriyên
xwe de dibêje:eger li gor daxwaza
Noêl ba,gumana min hebû ku dewle-
ta Kurdistana mezin dê ava bibe,lê
mixabin,Noêl gelek li Kurdistanê
nema û Îngilîzan ew şande devera
Qafqas û di vegera xwe de,Şoreşge-
rên Cengelî ew dîl girtin.Li sala
1919-ê hukumeta Berîtanya biryar
da ku Şêx Mehmûd bibe hukumdarê he-
rêma Silêmaniyê.Helbet Îngilîzan ji
bo berjewendiya (meslehet)xwe ev bir-
yar da bû.Li wê demê ku bo wan eş-
kera bû ku Şêx Mehmûd bi vê desthe-
latdariya bê serûber razî nabe,ji-
bilî vê ji lawaziya (zeîfî)tirkan
û pirsgirêkên wan yên hundirî rê ne-
dida wan doza wîlayeta Mûsil bikin
Îngilîzan bada û Mûsil bi hemî Kur-
distana başûr ve dane pal Mîzopotam-
ya û Îraqeka ser bi Berîtanya di-
rûst kirin.Jibilî ciyê Kurdistanê,
yê stratejî,bîrên petrolê jî bûn se-
dem ku Berîtanya her li wî demî bi-
yar bide ku astenga pêşeroja Kurd-
istanê û Îraqê li ser wan bîrên pet-
rolê wesan çareser bike ku her du-
wan bike yek û bixe jêr destê xwe.
Ji bo vê mebestê jî Feysel ji Hica
zê anîn û hukmet û dezgeh li dest-
helata xwe diras kirin û Kurdistan
dane pal Îraqê.Belgeyên nihenî û
raportên wî serdemî jî xuya dikin,
ku xelkê Kurdistanê ne bi hukmê
Feysel û ne jî bi girêdana Kurdis-
tanê bi Îraqê ve razîbûn.

Li sala 1919-ê hêzeka Îngilîzan bi
serokatiya ceneral Fraizer heriş bi-
re Bendî-Baziyan û li wir şereke
dijwar li navbera wan û Şêx Mehmû-
dî çêbû,lê ji ber destkurtiya şêx
Mehmûdî û nebûna çekî û xiyaneta hin
de kurdan-weke Mişîrê Heme Sîmanê
Hemawendî-Şêx Mehmûd û leşkerê xwe
şikestin û şêx Mehmûd li Berdeqera
manê bi destê serbazekî birîndar bû
û bi dilî hat girtin û bi birînên
wî ve hinartine Çemçemal û li wir
dadgeha leşkerî biryara lisêdareda-
na wî da,paşî biryara dadgehê hate
guherîn û şandine Hindîstanê.

Di dadgehê de,ji Şêx Mehmûdî pirs-
în: te çima ev şere helkir û tu we-
kî çeteyekî li hember hêza me ya
rizgarîxwaz derketî? Şêx Mehmûdî be-
rsiva wan da û got: ez ne çeteme ne
jî rêgirim, destê xwe bire di baxi-
la xwe de ku Quraneke biçûk û ben-
da "12"-an ji bendên serokê Emrîka
Wîlson î der anî û gotî,ez li gor
ve bende doza mafên neteweyiyên ge-
lê kurd dikim û ez niha jî her dîs
an li ser doza xwe me.Li wî demê ,
Şêx Mehmûd li Hindştanê bû,Ingili-
zan Mîcerson kirin hakimê siyasî yê
Silêmaniyê.Mîcerson bervajiyê Mî -
cer Noêl,mirovekî pozbilind û pir
ji Şêx Mehmûdî û binemalan şêxan
hers dibû.Herçend Mîcersonî zimanê
kurdî baş dizanî û ji bo pêşdabiri-
na zimanê kurdî texsîrî ne kir û
di serdema wî de,zimanê kurdî bû zi-
manê resmî di xwendingeh û dezgeh-
an û alfebeyeka kurdî çapkir û alî-
kariya nivşikar û şaîrên kurd di-
kir ku afrandinên xwe bi zimanê kur-
dî binivîsînin û xelatek berhevkir
ji bo her kesê baştirîn şîr yan ni-
vîsin binivîse,lê ya rastî ew karê
wî her ji bo berjewendiya Îngilîz-
an bû û dixwest bi vî awayî xwe li
ber xelkê şêrî bike,ta ku xelk bê-
tir ber bi wan biçin û li jêr emrê
wan bin.

Dûrketina Şêx Mehmûdî û mana wî li

Xwedî :
Cemşîd Heyderî
Berpirsyar & Redaktor:
Kerîmî Hussamî

# Serdema Nû

JI ALÎ DESTEYA NIVÎSKARAN VE TÊT BELAVKIRIN

Sal 1 Hejmar 9 Oktober 1986 Bıha:6 Kronê Swedı

## YADI ŞÊX MEHÛDI MEZIN

Şêx Mehmûd,li sala 1880,li bajarê Silêmaniyê ji dayik bû,ji binemala şêxên Berzincî ye.Nav û dengên vê binemalê,bi hoyê şêx Marifê Nodê û Kak Ehmedê şêx,li Kurdistanê belav bûne.Li paş ku mîrnişîna Baban têkşûyî û leşkerê Osmanliya bajarê Silêmaniyê dagir kirî,ev binamale bû cêgira desthelatdariya deverê û jibilî desthelatdariya ayînî (dînî), desthelatdariya siyasî jî kete destê wan û ev desthelatdariya wesa xurt bû ku Soltanên Osmanliya jî hurmet jêre digirt.

Yekem beşdar bûna vê binemalê di piştgiriya Osmanliya de,ew bû ku kak Ehmedê şêx hêzek ji mirîd derwêşên xwe pêkanî bi serokatiya kurê xwe şêx Seîdî û ev hêz çû alîkariya Osmanliya. Osmanliya jî şêx xelat kir û 5 gund jêre kirin diyarî,her weha coya Kak Ehmedî jî li Awbare û Bekreco ku ev bûn aboriya wan.Şêx Seîdê bavê Şêx Mehmûdî dostekê nizîkê Soltan Ebdilhemîd bû.Solatanî şêx dawet kir bû ku biçe Stenbolê. Li Mûsil desteka ser bi "Îtîhad û Tereqî" ku dijî Soltan Ebdilhemîdî û dostên wî bûn, pîlanek kêşa û li roja cejnê karîn şêx Seîdî û şêx Ehmedê kurê wî û çend kesên din bikujin. Şêx Mehmûd û şêx Qadirê birayê wî,li ciyekî din xwe parastin û ligel 120 kesan bi riya Hewlêrê xwe xelas kirin û çûne Silêmaniyê.

Dema Îngilîza li destpêka şerê cihanê yê yekem li roja 6/11/1914-an bajarê Faw li bajûrê Iraqê dagîr kirî û ber bi jor hatin,Waliyê Osmanlî bi navê xezayê (cîhad)daxwaz ji êrîşên Kurd û Ereb kir ku li hember Îngilîza rawestin.Kurdan li ser wê daxwazê leşkerek ji hezar çekdara pêkanî û bi serokatiya Şêx Mehmûd beşdarî şerê "Şuêbe"bûn.Lê Osmanlî xerab di vî şerî de şikestin û li dawiya meha nîsana sala 1915-an paşda vegerîn,piştî ku 2500 kuştî û birîndar jê ketin û 800 kes jî bi dîlî hatin girtin.Piştî vê şikestina Osmanliya Şêx Mehmûd vegera Silêmaniyê.Li sala 1917-an,dema leşkerê Rosya Qeyserî gihaye devera Wilyawa li Şarbajêr,şêx Mehmûd bi xwe hêzek leşkerî pêkanî û çû

## ŞEŞ SALIYA DESTHELATA FAŞIST LI TIRKIYE

Di 12-ê meha îlona îsal,şeş sal bi ser inqilaba generalên tirk derbas dibin.Berî sala 1980-î tekoşîna nêzên demokratên Tirkiyê kar dikir ku rê ji demokrasiya burcuwazî re vekin û bayê azadiyê,hewayê germ û pîsê çend salên Tirkiyê pak bike ji bo ku xelk bikare bi azadî bijît. Paşverû, bucuwaziyên kompradorên tirk û Împeryalîzma cîhanê,bi taybetî Emerîkî hevgirtî, xwediya dehan bas û bingehên eskerî û aborî ne dikarîn bibînin vaye li Tirkiyê demokrasî saz dibe,qelem, ziman bîr û baweriyên azad,partî û rêxistinên siyasî û demokrat tekoşînê dikin ji bo ku demokrasiya burcuwazî ciyê paşverûtî û diktatoriyê digire. Bi taybetî netewa me ,li paş çend salên çewsandin û serbirînê, dest bi damezrandina partî û rêxistinan kiri bû û giraniya xwe nîşan dida di meydana (qad)siyasî û civakî ya Tirkiyê de.

Ev baye bi dilê împeryalîzm û paşverûyên hundir nebû. Divê her çawan ba rê lê bigrin.Li destpêkê hinek deste û gropên paşverû û terorîst saz kirin û dest bi şerê hêzên demokrat kirin.Di salekê de, bi sedan kes bi destê tawankarên (cîneyatkar) ser bi MIT û CIA hatin kuştin û tirs û betenahî li temamî Tirkiyê belav bû.Paşî bi heveta vegerandina tenahiyê generalên tirk bi şîret û alîkariya Waşîngton înqilab kirin û hukmê sosyaldemokratê Ecevît herifandin û dest

r.4